

**Materyalên zanyarî / agahdarî bo dawakarên gorî
SGB II (= Pertuka Yasaya Komelgehî II)
- Kesên bi nijadê biyanî -**

Bo axaftinan li gel Fermangeha Kar ya herêmî (Kommunaler Jobcenter -KJC) karpêkirinên serekî:

1. Li gel hemu axaftinan delîlek nasnameya xo pêşkêş bikin.
2. Divêt hun di dema b we re hatiye girêdan, amade bin.
3. **Axaftinên bê demnîşankirîya pêşî di demên karkirinê de bes li fermandeyên xizmetguzarîya deverî ya cihên Meiningen u Schmalkalden mimkun e.**

Beşa I

Zanyarîyên giştî li ser fermandeya xizmetguzarî/dawakarî

Heke hun zelalkirina pirsekê dixwazin, cihê yekemîn ya serlêdana we fermangeha xizmetguzarî (Servicestelle) ye.

Hun dikan serîlêdanê hem li Meiningen hem li Schmalkalden bikin.

Bo pêşkêşkirina daxwaza pareyê bêkarîyê II (Arbeitslosengeld II) xo şexsî navnîşan bikin.

Li fermangeha xizmetguzarî ji bal karmendan wade bo emnîkirina jiyانبirêvebirinê u bo rêvekikirina kar dihêt dayin.

Demên vekirîbuna/karkirina fermandeya xizmetguzarîyê li jêr in:

Demên vekirîbuna/karkirina fermangeha xizmetguzarîyê li Meiningen

- Duşem ta sêşem ji demjimêr 08:30 ta 12:00
- Pêncşem ji demjimêr 08:30 ta 12:00 u ji 13:00 ta 17:30
- Heynî ji demjimêr 08:30 ta 12:00

Çarşem girtî (daxistî) ye. Ev roj axaftin li cihê Meiningen mimkun nîn e.

Demên vekirîbuna/karkirina fermangeha xizmetguzarîyê li Schmalkalden:

- Duşem ta sêşem ji demjimêr 08:30 ta 12:00
- Pêncşem ji demjimêr 08:30 ta 12:00 u ji 13:00 ta 17:30

Sêşem, çarşem u heynî girtî ye. Van rojan axaftin li cihê Schmalkalden mimkun nîn e.

Dawakirin bo wergirtina alîkarîyan gorî SGB II

Dawakirin bo wergirtina alîkarîyan gor SGB II li fermangeha xizmetguzarêya cihên Meiningen u Schmalkalden mimkun e.

Divêt hun di çarçova dawakarîyê/faxwaznameyê de van tiştan bi cîbicîbikin:

- Daxaznameya we wergirtîye bêkêmasî tijî/pirr bikin u destnîşan/wajo bikin.
- Temîna saxlemîyê hilbijêrin u nasnameya endamîye bidin bidin derxistin
- Daxwaza konto bikin/vekin
- daxwaza pareyê zarokan ji kasa malbatê daxwaz bikin
- Ji fermandeya komelgehê jimara bacê bo xo werbigrun
- Jimara muçexurî (xanenêînî) ji temîna saxlemîyê bigrin

Divêt hun çî zanyarî li ser malbata xo bidin:

Zanyarîyên li ser hemu endamên malbatê yê civaka alîkarîdanê

evan kesan

hevjîn u jinumêr
zarokên 25 salîya hîn tije nekirine

zanyarîyên divêt werin dayin

navê bêkêmasî, roja ji dayikbunê, navnîşana niştecihê,
rewşa komelgehê (zewicî an azeb), welatê ji dayikbunê,
cihê ji dayikbunê, rewşa îqameyê

Zanyarî bo civaka pêwistîya alîkarîdan yê bo zarokên diçin baxçeyê zarokan:

Daxwaznameya xercên baxçeya zarokan divêt li fermangeha taybet ya ciwanan li qeymaqamîya Schmalkalden-Meiningen were pêşkêşkirin.

Zanyari li ser alîkarîyen ji pakêta perwerde u beşdarîyê

Evan alîkarîyên bo zarokên 25 salîya xo neqedandine u alîkarîya civakî (pareyê bêkarê II, parêya kirê, alîkarîya gorî yasaya penaberan AsylbLG) werdeigrin.

ÎSTÎSTNA: Alîkarîya “beşdarîya komelayetî”, wekî endamîya di komelên werzişî de, an jî çalakîyên dema vala bes heta temenê 18 salî dihêt dayin.

Alîkarîyen ji pakêta perwerde u beşdarîyê ev in:

- mesrefên firavînen civatî li baxçeyê zarokan
- serxowergirtina mesrefên geştên yekrojî an pirrojî yê dibistanan/qutabxaneyan
- beşdarîya komelgeyî (weku endamtîya di komelên werziş/sport, çalakîyên demê azad/vala
- serxowergirtina mesrefên piştgirîya fêrbunên şexsî/alîkarîya fêrbunê
- serxowergirtina mesrefên hatuçuyên qutabîyan/xwendekaran

Dawakarîya perwerde u beşdarîyê

- bi dawakarîya bo pareyê bêkarîyê II weke dawakirî dihêt qebulkirin (îstîsna: Piştgirîyên bo alîkarîya fêrbunê divêt bi taybetî werin xwestin) ;
- paêkoyên pêwist bo serlêdanan li fermangehên xizmetguzarî berdest in u li wir dikanin bo xwe bibin yan jî dikanin ji malpera Jobcentera deverî <http://www.Ira-sm.de/jobcenter> daxênin u li kompâter pîrbikin/tijîbikin;
- paşkoyên bo daxwaznameyên (weku tamînkirina nîvroj, beûdarîya civakî) pêwiste ji bal fermangehên xwedan berpîrs (bo xwarinên firavîne weku pêşkêşkerê xurekê li baxçeyê zarokan yan ji hêla dibistanê) were tijî kirin.

Beşa II Zanyarîyên giştî li ser alîkarîyên temîna birêvebirina jiyani

Piştî ku fermangeha komelgayî/civakî nivîsên daxwazîyê u herwiha muîdek bo pêşkêşkirina daxwaznameya we da, divêt hun di vê **muîdede** amade bin.

Divên hun di **dema dîyarkirî** ya muîdede amadebin u nivîsên we girtibu tijîkirî **bê kêmasî** bi xwe re bînin.

Alîkarî gorî qaîde bo kontoya we dihêt hawalekirin.

Mesrefên kirê gorî qaîde seranser bo xudanê xanî dihêt hawalekirin.

Hun alîkarîyê di **destpêka mehê/heyvê pêşîn** werdigrin.

Hatin u sermayên we yên bi ser meblaxa azad dikevin bi alîkarî dihên hesabkirin.

Di demên wergirtina pareyê bêkarîyê II hun temînkirîne.

Heke hun wazîfeya xwe bê mebestekî maqul cîbicînekîn pareyê bekarîyê II dikane bihête kurtkirin, kurtkirin dikane dubare jî bibe. Alîkarî dikane bi giştî jî were birrîn.

Guherrandinên di reşa şexsîde divên **bê derengî werin nîşandan.**

Pêwistîya qîdeyî bo pareyê bêkarî II ji bal hikumeta federal bo beşên kesan (yên tenha dijîn, zarokên temenciyawaz u.y.d.) bi nîrxên cuda cuda dihên tomarkirin. Bo bîna pêwistîya xo u bo endamên malbata xo ya guncaw li biryara bo we hatîye şandin binerin.

Serxowergirtina mesrefên xanî u germayê

Mesrefên kirê u germayê bi qaîde gor rewşê **maqul** be dihên serxowergirtin. Ji ber ko ev mesref ji dahatên komelgayîya deverî/herêmî dihên dayîn, dikane cawazî di nabeyna fermangehên herêmî de hebin

Bi kerema xwe berî ku hîn xanî kirê bikin agahîyê ji jobcentera xwe bigrin u gorî wê daxwaza pêşkêş bikin, ka gelo kirîya xanî u mesrefa germayê bo we maqul e an na.

Heman tişt bo barkirina ji xaniyaki bo yeki din ji derbas dibe.

Mesrefên kahreba, telefon u.y.d. ne beşên mesrefên kirê ye. Van mesrefan divêt hun ji pareyên bo jiyana we dihêtin dayin veqetînin.

Pêwerên/pîvanên xaniyê maqul mezinahiya xani u kirê u mesrefên yedeg u germayê ne.

Erkên taybetî yê mimkun

Bo yekemcar bicîhanîna pedawistîyên amarên/aletên navmalî weku tifik/ocax u maşîna şuştinê

- Bo yekemcar bicîhanîna pedawistîyên amarên/aletên navmalî dihêt qebulkirin, heke hun cara yekem bikevin xaniyekî u ev tiştên we nebin an kêmbin (dema hun ji bo xwe xaniyekî kirê bikin)
 1. Daxwazname bi rêzkirina tiştên pêdawistîyên navmalî,
 2. Dayin/piştevanî gor komegayên deverî cawaz n ango gor fermangehan alîkarî cuda cuda ne,
 3. Heke mirov bi giştî girêdayî alîkarîyê be/ ezmuna şexsî, balkêşana ser xobixualîkarî an pêşniyarên alîkariya komelgahî mimkun in,
 4. Paredayin a gor qena`et / dikane belgenameyên tiştkirrîn an pêdan were dayin

Bo pewistîyên zêde yê mimkun dikan (li ser daxwaznameyê) were dayin bo:

- dayikên ducan,
- kesên tenya,
- kesên kêmendamiyê yê di jiyana kar beşdar in pêwistî bi alîkarîyê hebin,
- heke merc li ber dest bin, mesrefên pêwistîya zêdebuna xurekan,
- kesên xudanê pêwistîyên taybetî hebin (rêzkirina mercên giran),
- kesên bi taybetî xudan pêwistîya vîzê /enerjî hebin (amadekirina ava germ ji ber nebuna navendî)

Alîkarîyên/tiwanên din:

Heke pêwistî hebe, dikane alîkarîya taybet bo te`mîna komegehî (te`mîna nexwşî/saxlemî u te`mîna lêmêzekirinê) were dayin.

Heke pirsgirêk an pirs di dawayên tîwanên we hebin, serî li karmendê xo yê bo we xudan berpirse li jobsentera de vera we bidin



Fermangeha Meinigen

Landratsamt Schmalkalden-Meiningen
Kommunales Jobcenter
Obertshäuser Olatz 1
98617 Meinigen
Telefon: (03693) 485-444
E-Mail: sst_jobcenter@Ira-sm.de

Fermangeha Schmalkalden

Landratsamt Schmalkalden-Meiningen
Kommunales Jobcenter
Sandgasse 2
98574 Schmalkalden
Telefon: 03863 / 6820
E-Mail: sst_jobcenter@Ira-sm.de

Bi kerema xo balbidin: Bo axaftina di çarçowa te`mîna birêvebirina jiyani berî ku hun werin mu`îdekê bi karmendê bo we xudan berpirs re dîyar bikin u pirsgirêka xo bidin nasandin bo çareserîya zu ya pirsgirêka we.

Beşa III

Zanyariyên li ser pişka yekxistina nav kar

Naverokên axaftinê

- axaftin li ser rewşa **jiyana we ya serdemî u pênasîyên we yên pişeyî**
- pêwistî bi pêşkêşkirina **bawermame u jîyanname** heye
- zelalkirina îmkanên naskirina pişeya we di axaftina şewirmendîyêde
- beşên baskirnê, perwerdehiya pişeyî, rewşa malbatî, saxlemî, zanyariyên zimanî di profîla we de dihên berhevdanîn
- armanc ew e, ku şansên we yê li bazara kar de li ser bingeha tiwanî u îmkanên we dînin berçav
- bo we dê îmkanên cihgirtina pêşxistina tiwanîyên we dihên pêşkêşkirin. Evan dema pêwistî hebe nadina kursên entegrasyon u ziman jî digre nav xo
- em bi hevra rêkeftina bo girêdana b civakê amade dikin (ev girêbestek / eqdek e di navbera jobcenter a komelgehî u kesê pêdivî bi alîkarî heye). Ev armac u wezîfeyên konkrêt sazdikeye.

Naverokên bingehîn yên rêkeftina bo girêdana bi civakê ev in:

- **Maf bo van alîkarîyan**, bes di rewşa **mafhebuna gorî SGB II** hebe, heye.
- Hemu mu`îdên jobcenter yên komelgehî/civakî divêtin di **dema xo** de bin.
- armanca hemu çalakîyên di rêkeftina bo girêdana bi civakê de bo kêmkirina pêwistîya alîkarî u ji holê rakirin e. Divêt hun **herdem** bi vêya hevkar bin.

Tedbîr u wezîfeyên ên rêkeftî yên di rêkeftina bo girêdana bi civakê de dikanin werin guncandin, heke:

- guherrandinên girîng di rewşa we ya şexsî de pêkwere
- yan jî
- gihajtina armanca entegrasyonê bi bazara karve bi guncandin u guherrandin u bilezkirina rêkeftinê bi destkefe
- **Durketina ji cih** (= durketina ji cihê nişteciibunê) divêt **şexsî** u **nivîskî** li gel karmendê xudan berpîrs were daxwazkirin. **Mu`îda vergerrê** divêt bi tewzîm were danîn.
 - **Heke hun bêyî destura karmendê xudan berpîrs ji cihê bi karve girêdanê durkevin u ji bona kar bi dem nêzîkî ne amade bin, bo we alîkarî nayê dayin**
 - Divêt hun bêyî demwindakirin / derhal nîşan bidin, heke **tiwanîya we bo kar tune be** u ev dem **(ji roja yekem pêde) çend berdewam dike.**
Derengtirîn roja sêyem divêt raporta ku hun nikarin karbikin pêşkêşî jobcenter bikin.

Heke pêwistî bi beşdarbuna we ya kursek entegrasyonê hebe, dê bi we re di rêkeftina bo girêdana bi civakê de van tiştên jêr rêkeft bibe

Erkên/karubarên şewirmendê berpîrs/peywendîdar:

- Şewirmendê berpîrs piştgirîya we dike di hemu mesele u pîrsgirêkên girêdayî bi beşdarbuna kursa entegrasyon an zimanî de

Erkên/karubarên mafdarê alîkarîwergirtinê:

- beşdarbuna rêkupêkî, usulî,çalak di kursa entegrasyon de/hatina di dema xo de di destpêka xandinê de
- di demên nexweşiyêde birêberê kursê berî destpêka kursê agahdar bikin u (ji roja yekem pêde derengtirîn roja sêyem) raporta nexweşbuna xwe pêşkêşî rêveberîya kursê bikin.

- piştî beşdarbuna we ya kursa entegrasyon an kursa ziman bawernameya xo ya we bidest xistîye an belgeya beşdarbuna xo ê be daxwazî pêşkêşî karmendê peywendîdar yê jobcenter bikin

Heke pirsgirêk an pirsên peywendî hebin bi navbendîya kar an jî bi beşdarbuna we ya di kursek entegrasyon an ziman, serî li karmendê berpirs yê jobcentera deverî xin.



Fermangeha Meiningen

Landratsamt Schmalkalden-Meiningen
Kommunales Jobcenter
Obertshäuser Platz 1
98617 Meiningen
Telefon: (03693) 485-444
E-Mail: sst_jobcenter@Ira-sm.de

Fermangeha Schmalkalden

Landratsamt Schmalkalden-Meiningen
Kommunales Jobcenter
Sandgasse 2
98574 Schmalkalden
Telefon: 03863 / 6820
E-Mail: sst_jobcenter@Ira-sm.de

Bi kerema xo balbidin: Bo axaftina di çarçowa girêdan bi karve di destpêkêde mu`îdekê bi karmendê bo we xudan berpirs re dîyar bikin u pirsgirêka xo bidin nasandin bo çareserîyeka zu ya pirsgirêka we were dîtin.